

DÎ ÎMANÊ KURDÎ DE PEYVÊN “USA/WISA”, “ÛLO/WILO”, “WER/WERGANÎ”, “WÎNA/WÎNÎ/WANÎ”

Kurd, ji bo tiştêkî piştrastiya xwe dest nîşan bikin, yan jî bixwazin kiryanan anegoreyî daxwaza dilên xwe pêk bînin, peyvên mîna “usa/wisa”, “ûlo/wilo”, “wer/werganî”, “wîna/wînî/wanî”, “ewa/weha” bi kar tînin. Kesên ku kurdî nizanin (yan jî dizanin lê serê xwe pê nayêşînin), van peyvên dabaş ên jor ji hev cuda disêwirînin. Lê belê dema mirov baş bala xwe bide van peyvên, bi asanî pê dihesê ku, di rastiya xwe de ew hemû peyvek tenê ye, lê bilêvkirina wê cuda ye. Ji ber ku rayeka wan yek e.

Mînak:

Wisa: rayeka peyvê “w” ye.

Wilo: rayeka peyvê “w” ye.

Wer: rayeka peyvê “w” ye

Wînî/wanî: rayeka peyvê “w” ye.

Ewa/weha: rayeka peyvê “w” ye.

Baş e, eger rayek yek be, bilêvkin ji bo çi cuda ye? Bersiva vê pir asan e. Piraniya Kurdistanê çiya û geliyê kûr in. Dema mirov di çiya û geliyan de têkiliyên di navbera xoz û êlên curbecur ên kurdan bihizire, bilêvkinên cuda ên heman peyvê tiştêkî siruştî ye. Ji ber ku çiya û gelî, asê û dorpeçkirî ne. Her wiha di warê têkiliyan de îzolebûn derdikeve holê. Ji ber vê sedemê hin peyv bi şewazên cuda tên bilêvkin. Ji van yek jî “usa/wisa”, “ûlo/wilo”, “wer/werganî”, “wîna/wînî/wanî”, “ewa/weha” ye.

Wek tê zanîn di zimanê kurdî de du cinavkên şanîdanê yên tekane hene: di kurmançî de “ev” û “ew”; di dimilkî de “no”, “na”, carinan “în”, di sorankî de “em”, “ew” in.

Wisa diyar dike ku peyvên usa/wisa”, “ûlo/wilo”, “wer/werganî”, “wîna/wînî/wanî”, “ewa/waha” ji cînavk û rengdêrên şanîdanê yên tekjimar derketine holê. Ji ber ku hemû jî balkêşiya tiştêkî anegoreyî daxwazê yan jî taybetmendiyê didin diyarkirin. Di nav hevokê de him rengdêr, him jî hoker in. Ji ber ku, çawabûna heyberan nîşan didin.

Mînakî:

Bersiva pîrsa te “usa/wisa”, “ûlo/wilo”, “wer/werganî”, “wîna/wînî/wanî”, “weha” ye.

mînak	şewaz
Gelo pirtûka kê ûlo/wilo ye?	<i>Çawabûnê destnîşan dike, hokera pîrse ye</i>
Ka bisekine, wer meke!	<i>Liv û bezê destnîşan dike, hokera rewşe ye</i>
Ma ne wisa ye?	<i>Hokera pîrsê yeîş.</i>
Gustîlka hevala min jî wisa ye.	<i>Çawabûnê destnîşan dike.</i>
Ji kerema xwe re wisa mekin.	<i>Çawabûn û liv û bezê destnîşan dike.</i>

Ev hevokên jor hemû ji çawabûna heyber û şêwazê liv û beza kesan destnîşan dikin.

Di hin zimanên biyanî de peyva *asa/wisa*:

Proto-Hind-Ewropîkî **au-*, **u-* : (**u̯ē-*, **u̯o-*)¹ ‘ew’; **ay-*, **ayē-*, **ayēi* ‘pê divêtin, alîkarî’²; **ay-*, **ayēi-* ‘pehesîn, têgîhîştin, hay jê hebûn’³; Hittitîkî *kissan* ‘asa/wisa’; Horîkî *ula/uli*, ‘ya din’, *wandi* ‘rast’; Sanskritî *asan* ‘asa/wisa’, *iṣ* ‘wek, wirganî’, Latînkî *suad*, *ac sic*; Yonankî *ως*; Gotîkî *swa*; Arnawûdkî *aštu*; Romenîkî *aşa*, Hîndîkî *us*; Gurcîkî *ase*; Îzlandîkî *svo*; Îngilizîkî *so*, *such*; Fransîzkî *ainsi*; Îspanyolkî *asi*; Îtalîkî *cosi*; Danmarkî *så*; Swêdkî *så*; û hwd.

Di rêze peyvên jor ên biyanî de jî eşkere dibe ku jêderka peyva kurdî *asa/wisa* û hemwateyên (sînonîm) wê “*ûlo/wilo*”, “*wer/werganî*”, “*wîna/wînî/wanî*”, “*weha*” zimanê Proto-Hînd-Ewropî ye.

Wisa diyare ku tirkan **ûlo/wiloya** kurdî kirine peyva “**böyle/şöyle**.”

Bibliografi

Ali Husein Kerim, *Kürtçe Etimolojisi Sözlüğü*, Enstîtuya Kurdî ji bo Lêkolîn û Zanîst li Almanya, 2004
Julius Pokorny, *Indogermanisches etymologisches Wörterbuch*, vol. 1, Bern, Munich: A. Francke, 1959

¹ Julius Pokorny, 73-75:4

² J. Pokorny, 77-78: 7

³ J. Pokorny, 78:8